HER KARÊK KATÎ XOY HEYE

Lenya kîjoleyekî çust û çalak bû. Şewan zû dexewt û beyanyan zû heldesa, belam beyanîyekyan direng le xew hesta, leber ewey şewekey direng nûstibû, xoy be nîgarkêşanewe xerîk kirdibû. Ew beyanîye ke daykî çuwe jûrekey Lenyawe, bînî Lenya le xewêkî xoşdaye. Bangîkird: ***kiçim heste direngе.*** *Lenya culey lêwe nehat. Carêkî tirîş daykî be nermî bangîkirdewe û lexewî helsand.*

Lenya be hêwaşî çawekanî helhêna û xerîkbû helyangilofê, belam daykî meçekî girt û pêywit: ***nabê çawekant helgilofî, ebê demuçawt bişoyt.*** *Lenya bepele demuçawî şord û çû bo qutabxane, belam mawey 15 xulek dwakewt bû. Berêweber ke zanî Lenya be enqest dwanekewtuwe, amojgarîy kird ke rêzî kat bigrêt, çûnke wanekan û nîgarkêşan û xewtin her yekeyan katî xoy heye.*

Ebdulxalîd Sabîr
Wêne: Îsma'îl Umer Hesen
Latînî: Salih Bêçar

Ẍ خ ṙ,Ṙ ڕ v ڤ J,j ژ L,l ل F,f ف C چ Ḧ,ḧ ح Hh ه X خ Ç چ î ێ,ێ m,M م b,B ب y,î ی W,u و

O و ṣ ش s س Q,Ș ق Ḷ ḷ ڵ N ن g,G گ A,a ئا,ا ê,Ê ێ K ك r,R ڕ eE ە D,d د Z ز P پ T,t ت û,Û وو